


Kurdisk
kurmanji og
norsk bokmål



Dilopa biçûk

Lille dråpe



Gelo tu vî dengî dibihîzî?

Ev dengê qiçqiça pel û qirşikên li ber germa tava rojê hişk bûne ye.

Kan du se blader og kvister, tørket under den sterke sola?



**Lama li wê deverê, ji bo xwe ji germa rojê ya tûj bipolarêzin, li ser axa germ,
di bin sîya darekê de, bêdeng mexel hatine. Yekê ji wan got: „Ax! Ez xwe
pir jihevketî dibînim, bêhêz bûme.” Yeka din got: „Ez ji germa helîyam”**

Lamaene lå helt stille i skyggen av trærne, mot den varme jorda.

Den ene lamaen sa «Åh jeg føler meg helt slapp.

Jeg er så varm at jeg holder på å smelte!»



**Lamayan tevan bi hevre çavên xwe girtin, ketin xeyala rojên xweş ên şînahîyê
de! Lê dema ku dîsa çavên xwe vekirin, tiştek ji germ û ziwayê pêve nedîtin.**

Lamaene lukket øynene og drømte seg bort til grønne, fargerike, frodige dager!

Men da de åpnet øynene igjen så var det like varmt og tørt.



Serê sibeheke zû, brûskek ji nav ewran veda.

Tidlig en morgen kom et lyn fra himmelen.



Dema brûsk li erdê ket, agirekê biçûk derket.

Der lynet traff bakken, kom en liten flamme.



Agir zû belav bû û şewateke mezin çêkir.

Flammen spredte seg og ble til en stor brann.



Lama bi lez û bez ji ber agir reviyân.

Lamaene begynte å løpe fra brannen i full fart.



Gava ku hinekî ji êgir dûr ketin, rawestiyan, li dûv xwe nerîn. Wan dît ku mala wan di nav agirê mezin de winda dibe.


Da de var kommet et stykke, stoppet de for å se seg tilbake.

De så hjemmet sitt forsvinne i store flammer.



**Ji dûrv ve, li ser wê dûmana gewr a ku ezman girtibû temaşe kirin. Wan
xalake sor a biçûk di ser wê dumanê re dît. Ew xal, geh ber bi pêş û geh ber
bi paş ve diçû û dihat, diçû û dihat.
Ji avê ber bi êgir ve, û dîsa vedigerîya ser avê.**

Langt der borte, rett over den grå røyken kunne de se en bitteliten
rød prikk. Prikken beveget seg fram og tilbake, fram og tilbake.
Fra et vann, til brannen og tilbake til vannet.



Gava kû ji nêzîk ve lê nêrîn, dîtî ku ew xal, çûkekî kolibrî yê biçûk û bi nîklên sor e. Kolibrîyê bi nîklê xwe radihişt dilopên avê û ew bi ser êgir de berdidan, û careke din paş ve vedigeriya da avê zêdetir bîne.

Da de kikket enda nêrmere sâ de en bitteliten kolibri med rødt nebb. Kolibrien hentet vanndråper, slapp dem ned over brannen og fløy tilbake for å hente mer.



Tevaya lamayan dest bi ken kirin.

Yekî ji wan got : „Hahaha! Ew çi karekî vale ye! Li wan dilopên biçûk binêrin. Li wî çûkê biçûk temaşe bikin. Gelo ew wilo çi dike?”

Lamayeke din got: „Min tiştek ji vî karî pûçtir neditîye! Gelo ew dixwazê çi bike?”

Lamayeke din bi dengê bilind got „Silav li te kolibrî ya biçûk! Gelo tû bawer dikî kû tû bi wan dilopên biçûk vî agirê mezin vemirînê?”

Da begynte alle lamaene å le.

«Haha, noe så teit! De bittesmå dråpene! Den lille fuglen! Hva er det den driver med?», sa den ene lamaen.

En annen lama humret: «Det er det dummeste jeg har sett!

Hei du lille kolibri! Hva tror du at du kan gjøre med de små dråpene mot den store brannen?».



**Bêyî kû xwe bêzar bikê kolibrîyê bersiv da û got „ji bo
vemirandina êgir evqas ji min tê”.**

Uten å la seg forstyrre, svarte kolibrien:
"Jeg gjør det jeg kan for å slukke brannen."



Lamayan matmayî li hevûdu nêrîn. Pişt re bilez yekî piştta xwe da kolîbrîyê ...



Lamaene så på hverandre med store øyne. Den ene snudde ryggen til kolibrien ...



... û ber bi avê de baz da. Lamayeke din da pey, û yeke din jî. Di dawîyê de, hemû bûn rêz dan pey hev da kû mîna kolibrî ya biçûk avê bînin û êgir vemirînin.

... og begynte å løpe av gårde. En av de andre lamaene fulgte etter, og så en til. Til slutt var alle på vei mot vannet i en lang rekke for å hente vann slik som den lille kolibrien.





Finn flere fortellinger på morsmal.no

Fortellingen er laget med illustrasjoner av Alando Bernard